



**BERNAME Û PEYREWA  
PARTIYA DEMOKRAT YA  
KURDISTANA ÎRANÊ (PDKÎ)**

**Pesendkiriya Kongireya 16`an  
Kongireya "Rasan A Rojhilat"**



*PDKI Media © 10 March 2018*



# DESTPÊK

Kurdistan ketiye herêmekê ku jê re dibêjin "Rojhilata Navîn". Kurdistan di warê çavkaniyên sirûştî de herêmeke dewlemend e. Ew. warê derketina gelek şaristaniyên dîrokî û ayînî yên cuda ye. Ji wan şaristaniyan jî gelek çiq vebûne û her yek ji wan çîqan jî xwedanê pêgeha xwe ye. Rojhilata Navîn di warê çandî û netewî de jî herêmeke pirreng e û gelek netew tê de dijîn. Her yek ji wan netewan xwedanê kultura xwe ye û her yek ji wan kulturan jî xwedan nasname û nirx û giraniya xwe ye. Rojhilata Navîn, di destpêka sedsala bîst de dema dewletên modêrn ava bûn û besêk ji gelên wê ji mafê xwe yê destnîşankirina çarenivîsê hatin bêparkirin, bû navenda arfşê û aloziyan. Di vê Rojhilata Navîn de netewa Kurd xwedanê şaristaniyeke kevn e. Kurd di serdema împiratoriyyen mezîn û kevnar de xwedan desthilatdariyeke taybet bûn. Ew desthilatdarî ji yên derdorê cuda bû. Desthilata Madan li ser bingeha yekîtiyeke dilxwazane ya qewm û eşîrên Zagrosê pêk hatibû û sîstema îdareya wê jî sistemeke şîrîkatî bû ku hebûna hemû cudahiyan tê de hatibû gebûlkirin.

Diroka Madan nîşan daye ku tenê li hember êrîşen derive li ber xwe daye û êrîşti ti kes û gelekî din nekiriye. Berevajî împiratoriyyen derdorê, Mad xwedanê ayîneke fermî jî nebûne. Pişti hilweşiyana desthilata Madan, her çi qasî Kurd nebûbin xwedanê desthilateke yekdest, lê diroka Kurdan tijî xebatên rizgarî û bergiriyê ye. Li her cihekî Kurdistanê jî karîbin, desthilata xwe ava kirine.

Şaristaniya Kurdan di nasnameya netewî û siyaseta organize û hikûmeta modêrn ya Kurdan de reng vedaye. Tevî siyaseta Îñkarê ya dewletên ku bi darê zorê Kurdistan xistine destê xwe, di navbera şaristaniya kevn û nasnameya netewî ya Kurd de berdewamiyeke dîrokî heye, mirov vê yekê di gotar û kiryarêni siyâsi de jî dibîne. Mirov dikare mînakîn hikûmeta modern ya Kurdan wiha bîne ziman; li Rojhilat sala 1324 (1945 z) li Başûr pişti Raperîna



1370 (1991) li Rojavayê Kurdistanê ji sala 1394 (2015).

Di tevahiya wan rêveberiyan de, ne tenê daxwazeke wan nebûye ku ayîneke wan ya fermî hebe, belkî tekezî li ser tolêrans bo cudahiya ayînî, mezhebî û etnîkî jî kirine. Hêja ye ku mirov bêje Partiya Demokrat, ku damezirênera Komara Kurdistanê ye, sêkolarîzm û pevreyiyana aştiyane bi netew û ayînêndin re wek rêça xwe ya serekî hilbijartîye û ji sala 1324 (1945) ve heta niha li ser wê rêçê dimeşe.

Kurd yek ji mezintirîn netewên bêdewlet in. Axa Kurdistanê piştî Şerê Çaldiranê, ku sala 1514 z di navbera İmpiratoriyen Osmanî û Sefewî de qewimî, berevajî îrade û xwasta Kurdan hat perçekirin. Ev perçekirin sala 1636 z bi îmzekirina "Peymana Zehaw" di navbera Osmanî û Sefewiyan de, bi fermî hat ragjhandin.

Piştî şerê cihanî yê yekem, ax û gelê Kurdistanê dîsa rastî perçekirinê hatin û vê carê bûn çar perçe û bi ser welatên Iran, Tirkîye, İraq û Süriyê de hatin parvekirin. Mafêن Kurdan li tevahiya wan welatan û ji aliyê wan dewletan ve hatine zeftkirin û binpêkirin.



## XEBATA NETWEÎ LI KURDISTANÊ

Xebata netewî ya Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê bo bidestxistina mafê destnîşankirina çarenivîsê beşek ji xebe ta giştî ya netewa Kurd e. Ew xebat di salên dawî yênsedsala nozdem de bi geşbûna hizra netewî li Rojhilate Navîn derketiye holê. Ji sala 1880'î ve û bi destpêkirina Serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî li dijî dewletên Osmanî û Qacar, daxwaza avakirina dewleta serbixwe ya Kurdan derket hole û xîmê hizra netewî li hemû Kurdistanê hat danîn. Lê ji ber geşenkirina aborî û pişesazî û herwiha astengkirina sistema perwerdeyê û nebûna derfet û alavên pêwendî û ragîhandinê bo belavkirina hizra netewî di nav civakê de. xebateke organîze û berfireh li vî beşê Kurdistanê derengtir çêbû. Lê disa ji pêşengên civaka Kurdistanê ti carî ji

hizra rizgariya netewî dûr neketin. Lo li Îranê di salên destpêkê yênsed la bistem de. dema desthilatda xwestin sistemeke serkutker ava bil rûbirûyî berxwedana gelê Kurdistan hatin. Dema Riza Xanê Pehlewî şahê Îranê, hizra dewlet-netew bi d zorê li ser gelên Îranê hat sepandi asîmîlasyona gelên din li Îranê bû yaseta fermî ya dewletê. Herwiha h hat dayîn ku wî welatê ku berê tenê v

çarçoveyekê bû ji bo gelan, bikin n nameyeke sexte û navê Netewa Îranî bikin. Di nav tevahiya gelê û netev Îranê de li dijî siyaseta asîmîlasyo tinekirinê serhildan çêbû. Di nav k dan de ji li dijî wê sistemê serhik derket. Yek ji navdartirîn serhildar Kurdan, Serhildana Simkoyê Şîl bû. Serhildana Simkoyê Şîkak ji bû



avakirina statüyeke netewî bo gelê Kurd bû.

Serhildana Simkoyê Şikak hevdam bû li gel serhildanen netewî yên Şêx Mehmûd Berzencî li Başûr û Şêx Se`îdê Pîran li Bakûrê Kurdistanê. Wan jî li dijî dewletên nû yên Îraq û Tirkîyê serî hildabûn. Wan serhildanan firsendeke dîroki bo gelê Kurd afirandibûn da ku Kurd bikarin çarenivisa xwe destnîşan bikin. Lê şert û mercen dijwar yên navdewletî yên wê çaxê zêdetir bûn sebeba wêyekê ku Rojhilata Navîn bibe meydana lîstikên stratejik yên hêzên mezin.

Nebûna zemîna hundir û êrifşen berfireh yên Îraq, Îran û Tirkîyê û piştevanen wan, bûn sebeb ku her sê serhildanen Kurdan bişkên. Gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê piştî wî şikestinê dest ji xebata xwe berne-da, dîsa li gorî şert û mercen herêmî û cîhanî dest bi xebata xwe kir. Ji ber wê jî pêşeng, mezin û rewşenbirêñ

Kurd 16`ê Tebaxâ 1942`an biza-va "Jiyanewey Kurd" (J.K) ava kirin. Ew bizav bi awayekî veşartî hat ava-kirin.

Piştî sê salan xebata veşartî, 16`ê Tebaxâ 1945`an Partiya Demokrat ya Kurdistanê li ser xîmê wê bizavê û li gorî şert û mercen hingê hat avakirin. Partiya Demokrat rêxistineke modêrn bû û bi rêbertiya Pêşewa Qazî Mihemed hat avakirin. Ev yek bersivek dîroki

û hêja bû bo wê qonaxa ku bizava me ya rizgariya netewî tê re derbas dibû.

Avabûna Partiya Demokrat ya Kurdistanê wek tekane pêşeng û organizatora tevgera millî-demokratik bo bidestxistina mafen gelê Kurd, gavêke kiritik bû di dîroka xebata netewî ya Kurdan de. Di dîroka modêrn ya Rojhilatê Kurdistanê de Partiya Demokrat yekemîn partiya Kurdistanî bû ku bi girîngiya rêxistina siyasi hesiya.

Jixwe bi pêşengtiya vê partiyê bû ku gelê Kurd bo cara yekem di dîrokê de bû xwedanê desthilateke niştimanî û demokratik ya komarî. Rêberê berketî yê vê partiyê Pêşewa Qazî Mihemed roja 2`ê Rêbendana 1324 (22`ê Çileya 1946) `an bi fermî avabûna Komara Kurdistanê ragihand. Û bû serokê wê komarê. Komara Kurdistanê di heyama temenê xwe yê kurt de, ku 11 meh bû, komek destkeftên biqîmet bo gelê Kurd bi cî hişt.

Piştî hilweşîna Komara Kurdistanê û bidarvekirina Pêşewa Qazî Mihemed (30`ê Adara 1947`an) ji aliye rîjima wê çaxê ya Îranê ve, xebata Partiya Demokrat derbasî qonaxeke zehmet bû lê Partiya Demokrat wek partieke pêşeng berdewam bû li ser rêça Komara Kurdistanê û erka rêxistina bizava millî-demokratik ye gelê Kurdistanê domand.

Xebata çekdarî ya ku Partiya Demokrat salén 1967-1968 encam dabû, piştî Komara Kurdistanê dîsa dengê azadîxwaz yê Kurdan li Rojhilatê



Kurdistanê gihadn guhê dinyayê. Her çiqas wê carê jî xwîna komek rêber û pêşmergeyên şoreşger yê Demokrat li ser axa Kurdistanê rijya jî, lê bi wê xebatê rûpelek din ya tijî serfirazî û qehremanî di dîroka xebata Kurd de hat tomarkirin. Dost û dijminên Kurdan ew rastî dîtin ku rêberiya Partiya Demokrat ya Kurdistanê her dem li eniya pêş ya xebat û fedakariyê ye. Jixwe ji ber wê fedakariyê ye ku Partiya Demokrat û jî geleki tê hezkirin û cihê baweriya gelê Kurdistanê ye.

Piştî serkutkirina vê tevgerê, rêberê zana yê Kurd Dr. Ebdulrehman Qasimlo rîbertya partiyê. Û herwiha rîbertya bizava millî-demokratik ya netewa Kurd li Rojhilate Kurdistanê da ser milê xwe. Dr. Qasimlo bername û bedena partiyê li ser bingeha kultura şoreşgeriyê û pîvanên demokratik darêt û Partiya Demokrat gihadn asteke bibandortir.

Piştî serhildana gelên Iranê li sala 1979 zayınlî. Partiya Demokrat ya Kurdistanê roja 26'ê Sibata 1979'an, piştî zêdetir ji 30 salî xebata veşartî, mîtingek mezîn li bajarê Mehabadê li dar xist, û xebata xwe ya eşkere ragi-hand. Partiya Demokrat piştî şoreşa gelên Iranê daxwaziyên netewî yê gelê Kurd danî ber destê rayedarên rîjima Iranê, lê wê rîjîmê bi şer û serkutkirinê bersiva netewa Kurd û Partiya Demokrat da. Hingê rîjîma nû ya Iranê pêleke tundî û dijberiyê li hember gelan û beşek ji welatên cihanê jî da destpêkirin.

Di rewşike wisa de Partiya Demok-

rat, ku zanîbû naveroka wê rîjîmê paşketî û diktatorî ye, referando-ma ku bo xapandina gelan hatibû lidarxistin, baykot kir. Ji wê demê ve heta niha daxwaziyên netewî û demokratik yê gelê Kurd li Rojhilate Kurdistanê, bûn hêvinê tevahiya çalakiyên siyasi yê xelkê û Partiya Demokrat.

Bizava netewî li Rojhilate Kurdistanê, ji bifî pêdagirî li ser mafênet netewî yê gelê Kurd li wî besê Kurdistanê, bû sekoya xebata li dijî hemû cure kevnperestî, diktatorî û erkutkirinê jî. Wisa lê hat ku ne tenê azadîxwazên Kurd li besen din yê Kurdistanê, belki azadîxwazên Iranî jî ji Kurdistanê re hawara xwe gihadin guhê dinyayê. Ji ber wê jî xebata gelê me li Rojhilate Kurdistanê li ser du xetên rizgariya netewî û demokrasîxwaziyê pêşde diçe.

Di şert û mercen niha yê herêmî û cihanî de û piştî guhertinênu ku li herêmê qewimîn û hilweşîna peymanen kevn û derketina peymanen nû herwiha şerê li dijî radikalîzmê û serhildana "Buhara Erebî", destwerdana rîjîma İslamî ya Iranê li herêmê zêdetir bûye.

20 sal bi ser ragirtina xebata çekdarî ya Partiya Demokrat re derbas dibe. Komara İslamî dikarîbû vê bi kar bîne, û pirsgirêka Kurd û gelên din bi awayekî siyasi û sivîl çareser bike, lê Komara İslamî nîşan



da ku di hizir û ideolojiya wê de tiştek bi navê aştî û çareseriya aştiyane nîne.

Daxwazî û fişara gelê Rojhilatê Kurdistanê, bû sebeba vê yekê ku Partiya Demokrat qonaxeke micidtr û nû di pêxema bikaranîna hêz û şiyana civaka Kurdistanê bide destpêkirin, ku di nav xelkê Kurdistanê wek qonaxa "Rasana Rojhilat" hat binavkirin û naskirin.

Rasana (Rabûna) gelê Kurd di vê qonaxê de hewl dide hêza Pêşmerge û hêza gel û herwiha xebata çiya û bajar pêkve girê bide, û bi vî rengî eniya xebata rizgarîwazane berfirehtir bike. Ev erka giran û tiji serfirazi, bi xwîna şehîdên nû bi taybet bi xwîna kadr û rayedarên Partiya Demokrat hatiye ne-xişandin. Rasana Rojhilat dixwaze tevahiya çîn û texên civakê xwe xwedanê xebatê bizanîn û tê de beşdar bibin.

## BINGEHÊN HIZRÎ Û SIYASÎ

Siyaseta Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li ser bingehhekê hatiye darêtin ku rûmeta/ kerameta mirov wek girîngtirîn nirxa jiyanê dizane. Di hizra siyasî ya modêrn de rûmeta mirov wek nirxekî gerdûnî hatiye nasîn û di Peymana Cîhanî ya Mafêni Mirovan) de jî, ku sala 1948` an ji aliye Netewêni Yekgirtî ve hatiye pesendkirin, girîngiyeke mezin bi rûmetê hatiye dayîn û wek "bingeha azadî, dadperwerî û aştiyê" di cîhanê de hatiye nirxandin.

Bi baweriya Partiya Demokrat, du çavkaniyênen serekî yêñ rûmetê hene; dabînkirina pêdiviyênen maddî yêñ mirov û pêkanîna atmosfereke siyasî û azad ku her kesek bikaribe bibe xwedanê kesyetî û nasname-

ya etnîkî, ayînî û neteweyî ya xwe û ste-  
ma regezî û cinsî jî nemîne. Divê mirov  
vê yekê qebûl bike ku jin rastî sitemeke  
bikom û dirêj hatine da ku jin bikarin ji  
serkutkirina kulturî, ayînî, siyasî, civakî  
û aborî rizgar bibin û ji rûmeta mirovî  
bêpar nemînin.

Ew mirovê ku di nav belengaziyê de hatiye hiştin herwiha ew mirovê  
ku nasnameya etnîkî û ayînî û netewî  
ya wî/wê hatiye înkarkirin yan jî rastî  
asimîlasyonâ siyasî û di bin zilma regezî  
de dijî, kerameta wî/wê hatiye zeftkirin.

Înkarkirina ziman, kultur û nasnameya  
netewî ya mirovê Kurd yan jî  
asimîlekirina wî/wê di nav kultureke

din de, tê wateya zeftkirina kerameta  
mirovê Kurd. Jiyana mirovê Kurd bi zi-  
man, kultur û nasnameya netewî ya wî/



wê wate dibîne.ji ber wê jî rijdbûn li ser mafênetewî yêndi Kurd rijdbûn e li ser nîrx û kerameta Kurd.

Netewa Kurd wan mafan dixwaze yêndi ku netewênen xwedan serweriya siyasi û netewênen xwedan dewleta serbixwe, ji bo xwe rewa dibînin.

Loma Partiya Demokrat, berevajî wan hêzên ku çavpoşiyê ji pirsa neteweyî didin, û tenê girîngiyê didin kêşeyêن civakî û aborî, yan binpêkirina mafê takekes ji aliye dîktatoriyetê ve, pêdagiriya li ser nasnameya neteweyî û rêzgirtina ji kerameta mirovî ya neteweyên belengaz wekî pirsa bingehîn dibîne. Bi kurtî PDKî zulm û stema regezî, neteweyî, û çînatî û herweha zulma li kêmendaman wekî astenga herî serekî dibîne li ser riya kerameta mirov. Ew têgihiştina felsefi û siyasi ji kerametê, di armancêne serekî û PDKî de reng vedide.

Siyaseta îñkar û sivikatîpêkirinê bi nîrx û sembolên netewî yêndi Kurd, Tirkêن Azerbaycanê, Ereb, Turkmen û Belûçan ji aliye rêjîmên Iranê ve, nişana wê rastiya dîrokî û siyasi ye ku di nav hikûmeta Iranê û hinek bizavan de, nasyonalîzma farsî bûye şovenîzm. Şovenîzim ne tenê li pêşıya wekheviya netewan astang e belkî hemî gavan bûye sebeba derketina dîktatoriye li Iranê de. Çimkî dîktatorî û komkirina hêza siyasi, aborî û serbazî li Tehranê, garantiya wê serdestiyê dike. Dewleta Iranê û beşek ji rewşenbîr, rojnamevan û hêzên opozisyonê ên neteweya Fars "cihêxwaziyê" yan jî "xirakirina ew-

lehiya Iranê" wek hêcet nişan didin, ji bona rewatiya serdestî û serkutkîrina netewênen din yêndi Iranê. Dewlet û beşek mezin ji opozisyonâ Fars ya Iranê, destepayva "cihêxwaziyê" wek sûc û tawanekî dibînin, û divê bersiva wê sûcê jî bi zor û hêza serbazî were dayîn! Ewa ku ew wek "cihêxwazî" bi nav dikin, heman mafê destnîşankirina çarenivîse ye, lê ew vê yekê berevajî dikin! Ew mafekî rewa ye ne sûc. "Ewlehiya millî" ji efsaneyeke vala ye ku bi darê zorê li ser Kurdan, Tirkêن Azerbaycanê, Ereb, Turkmen û Belûçan de hatiye sepandin. Dewleta Iranê destepayva "Ewlehiya millî ya Iranê" wek hêcetekî bi kar tîne bo parastina rêjîmeke dîktator, ku têkdana vê emniyeta stemkaranê, ne tenê sûc nine, belku rewa ye jî.

Ev zêdetirî sed salan e netewa Kurd tê înkarkirin û asîmîlekîrin, lê dîsa jî nekarîne netewa Kurd teslîm bikin, û ji daxwaziyênen wê bidin poşmankirin. Nasnameya netewî ya Kurd xwedan bingehîke "objective" e; ew nasname li ser bingeha ax, ziman, kultur û dîroka hevbeş pêk hatiye.

Netewa Kurd li ser wê bingehê dixwaze bigihê mafênetewî xwe û bibe xwedan serweriya siyasi li ser axa xwe. Kurd li Rojhîlatê Kurdistanê xwedan dîrokeke dûr û dirêj ya cînartiyê û pêkvejiyanê ne bi netewênen din yêndi Iranê re û dixwa-



zin rēz li maf û kerameta ïnsanî ya hev bigirin. Kurd di heman wextê de qebûl nakin ti kes û netewek mafêن wan ïnkar û binpê bike. Bi vî rengî, qebûlkirina nasnameya netewî ya netewan şerta yekem ya pêkvejîyana dilkwazane ya netewên ûrânê ye. Çarçoveya fikrî ya Partiya Demokrat û felsefeya ku ew li ser hatiye avakirin, li dijî diktatoriya rêjîma paşatî û teokrasiyê ye ku "Komara İslami" piştî şoreşa sala 1979'an li ser hatiye ava-kirin. Teokrasî (hikûmeta Xwedê yan rûhaniyet) dijberî demokrasî (hikûmeta gel) e. Partiya Demokrat di wê baweriyê de ye di şert û mercen niha de sîstemeke federal û demokratî çareya herî baş e. Ji ber ku di sîstemeke wisa de him

desthilat û him serwerî di navbera hikûmeta federal û hikûmetên herêmî de tê parvekirin. Ji bo netewa Kurd ya girîng ew e ku li ser axa xwe xwedan serwerî be.

Dabînkirina ewlehiya hundir ya Kurdistanê, siyaseta perwerde, siyaseta kulturî, civakî û aborî ya Kurdistanê divê di stûyê hikûmeta Herêma Rojhilatê Kurdistanê de be. Pirnetewbûna ûrânê wisa dixwaze ku sînorêن herêmên ûrâna federal li ser bingeha netewî-cografi werin kifşki-rin. Divê desthilat û derfet di navbera hikûmeta federal û hikûmetên herêmî de wisa bêن parvekirin ku mafêن netewan di çarçoveya herêma xwe de bêن dabînkirina û fîrsenda wekhev bidin netewan ku di rêveberiya sîstema federal de beşdar bibin.

## SOSYALÎZMA DEMOKRATÎK

Dadperweriya civakî; Divê her dem xebat bo wê yekê bê kirin. Ji ber ku eger dahat û darayıya welêt bi awayekî adilane neyê parvekirin dibe sedema newekheviyê û arîşeyên civakî. Dadperiya civakî bo avakirina sîstemeke xweşderbaskirinê; Di wê sistemê de pêdiviyên maddî yêن hemû endamên civakê li ber çav tên girtin û hewla dabînkirina mafê civakî bo her kesî tê dayîn. Bi ditina Partiya Demokrat ya Kurdistana ûrânê, avakirina civakeke bextewer li bser bingeha dadperweriya civakî, armanceke wisa ye ku ti carî nayê guhertin. Ji bona bîdestxistina wî mafî Partiya Demokrat, sosyalîzma demokratîk wek armancekê daye pêşîya xwe.

### Faktorên serekî yên wê civaka demokratîk û sosyalist ev in:

- Dadperweriya civakî; Divê her dem xebat bo wê yekê bê kirin.
- Ji ber ku eger dahat û darayıya welêt bi awayekî adilane neyê parvekirin, dibe sedema newekheviyê û arîşeyên civakî.



- Dadperiya civakî bo avakirina sistemeye xweşderbaskirinê;
- Di wê sîstemê de pêdiviyêñ maddî

yên hemû endamên civakê li berçav têne girtin, û hewla dabînkirina mafê civakî bo her kesî tê dayîn.

## BINGEHÊN GIŞTÎ YÊN SIYASETA PARTIYÊ

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li ser bingeha wan prensipên ku, dê bën behskirin, pişa xwe bi piştevaniya gelê Kurdistanê girêdaye û ji bona ku bigihê armancên xwe, bi hemû hêza xwe li ser xebata xwe berdewam e. Xalêjêrê di qonaxa niha de bingehêni giştî yên siyaseta Partiya Demokrat pêk tînin:

- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê ji bona çareseriya meseleya rewa ya kurd, bawerî bi metodên aştiyanê û diyaloga avaker heye.
- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê ji bo ku bigihê armancên xwe yên mirovî û netewî, südê ji hemû şêwazên xebata rewa, mafê berevaniyê jî di navde, werdigire yên ku li gorî bingehêni fikrî û siyasî û pîvanêñ navdewletî yên xebata rewa bin.
- Partiya Demokrat wek partieneke pêşeng, erka wê yekê di stûyê wê de ye ku hewl bide endam û alîgirêñ xwe li gorî perwerdeyeke hevçerx perwerde bike da ku civaka Rojhilatê Kurdistanê di bin serkut û perwerdeya îdeolojîk û zalimên komara İslâmî de rastî kultura ne mirovane ya rayedarêñ rêjîmê nebe û cîhaneke mirovitîr û wekhevîkwaz li ber çavêñ wan be.
- Partiya Demokrat hewl dide li hember êrişâ kulturî, zimanî û perwerdeyî

ya rêjîma şovenîstî kultur û Zimanê Kurdi biparêze û bi qasî şiyana xwe wan geş bike.

- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê alîgirê wê yekê ye ku bi netewên ku mafêñ wan hatine binpêkirin her wiha hêzên democrat û azadixwaz yên Îranê tifaqê bike û li ser pêwendî û hevxebatiya xurt di navbera netewên Îranê de rijd e.
- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê girêdayî serxwebûna biryardayînê yer her wiha xwe ji destwerdana di nav karêñ hundir yên saziyên di yên siyasî dûr digire û li ser rêzgirtina du alî û hevkariya dostane rijd e.
- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li dijî terorîzmê bi taybet terorîzma dewletê ye û vê yekê mehkûm dike. Terorîzm ango: Êrişâ bi ib mebest li dijî mirovîn sivil û tinekirina fizîkî ya rêberên siyasî û



kesen ku ji idoelojiya fermî cuda hizir dikin. Partiya Demokrat girêdayî parastina mafen mirov e û xwe piştevanê wan hêz û aliyan dibîne ku ji bo demokrasî û wekheviya navbera gelan û pêkhatina aştiye-ke kûr li Rojhilata Navîn xebat dikin.

- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê ligel bizava demokratîzasyonê ye û di wê baweriyê de ye ku daxwaziyen xelkê çavkaniya serekî ya rewatiya sistema rêveberiyê ye. Di şert û mercen niha de sistemeke demokratik û federal dikare mafen netewa kurd û netewen din yêñ ku zilm li wan hatiye kirin, garantî bike.
- Baweriya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê bi pilüralîzm û pir rengiya civaka Kurdistanê heye her wiha di wê baweriyê de ye ku pêwistiya kurdan bi yekrêziya netewî û niştimanî heye loma hebûna partyeke din ya xebatkar ji bona mafen gel hem pêwist dibîne

hem ji li ser hevkarî û xebata hevbes bo bidestxistina armanc û berjewendiyen bilind yêñ niştimanî û netewî pêkoliyê dike.

- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê rêxistineke xwedan statûyeke dirokî û gelêri ya Rojhilatê Kurdistanê ye ji ber wê jî divê wê potansiyela mezin ya gelê me bidestxistina wan armancen ku di Bernameya Partiyê de hatine ziman, bixe hereketê. Bi vî rengî bernamaya partiyê dibe hêzeke madî û aktif û dikare mafen demokratik û netewî yêñ netewa kurd di çarçoveya Îraneke demokratik û federal de bidest bîne. Ji ber wê jî vê bernamê radixe ber çavên gelê Kurdistanê û bang li hemû xelkê Kurdistanê dike bo bidestxistina armancen vê bernamê, bê navber xebat bikin. Her wiha divê tevahiya gelên Îranê bi taybet netewen blîndest yêñ Îranê ji daxwazên niştimanî, demokratik û netewî yêñ gelê Kurdistanê bêñ agah-darkirin.



# BERNAMEYA PARTIYA DEMOKRAT YA KURDISTANA ÎRANÊ

**Beşa Yekem**

## ARMANCÊN GIŞTİ

- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê hilgira alaya xebata netewî û demokratik ya xelkê Rojhilate Kurdistanê ye û bi netewên din yên Îranê re her wiha hêzên demokrat û pêşvero yên Îranê re ji bona avakirina sistemeke demokratik û federal li Îranê û bidestxistina mafêñ destnîşankirina qedera netewa kurd li Kurdistanâ Îranê xebat dike.
- Armanca dûr ya Partiya Demokrat ya Kurdistanâ Îranê, avakirina civakeke demokratik û sosyalist e.
- Diruşma stratejik ya Partiya Demokrat ya Kurdistanâ Îranê, dabînkirina mafêñ netewî yên gelê kurd li Rojhilate Kurdistanê ye di çarçoveya sistemeke demokratik û federal de, li Îranê.
- Partiya Demokrat, netewên bindest li Îranê hevqeder dibîne û piştevaniya xebata wan dike bo rizgarbûn û bidestxistina mafêñ xwe.
- Partiya Demokrat ya Kurdistanâ Îranê piştevaniya xebata netewî û demokratik ya netewa kurd li hemû besên Kurdistanê dike û ev yek rêça herdem ya wê ye.
- Partiya Demokrat li dijî her cure



ferq û cudatiyê ye çi di warê civakî de çi di warên reng, ol, ayîn, nijad, etnîk, regez û htd... de.

- Partiya Demokrat ji bona wekheviya civakî û nehiştina ferq û cudatiyên civakî, aborî, siyasi û kulturî yêñ li hember jinan têñ kirin, xebat dike.
- Partiya Demokrat ya Kurdistâ-

na Êranê piştevaniya xebata aştiyane, demokratik û netewî ya hemû netewen cîhanê dike û aligirê dostanî û aştiyê ye di navbera hemû netewen cîhanê de. Partiya Demokrat, gava firsenda xebata siyasi nebe, hemû rîkên rewa yêñ xebatê, mafê bêrevaniyê ji di nav de, bo netewen bindest rewa dibîne.

## Beşa Duyemîn

## Xîmêñ Ïdareya Hikûmeta Herêma Kurdistanê

■ Li gorî şertên niha yêñ Rojhilatê Kurdistanê, yanê qonaxa beriya rizgariyê. Partiya Demokrat lazim dibîne bernameyeke berfirehtir pêşkêş bike ku di heman demê de modêla rêveberiyeke demokratik bo paşeroja Kurdistanê û hikûmetek federal li Êranê tê de hebe.

■ Rojhilatê Kurdistanê yek ji wan herêman e ku bi awayekî dîlxwazane û li kêleka herêmên din, welatê federal yê Êranê pêk tînin.

■ Herêma Kurdistanê li tevahiya axa Kurdistanana Êranê vedigire. Çarço-veya cografiya Herêma Kurdistanê li gorî pîvanêñ cografiya netewî û daxwaziya piraniya akinciyan tê diyarkirin.

■ Li derveyî Herêma Kurdistanê, li her cihekî Êranê ku piraniya xelkê wir Kurd bin û daxwaza mafêñ xwe yêñ netewî bikin, Hikûmeta Herêma Kurdistanê piştevaniya wan dike û wan wek hevpeymanê xwe yêñ netewî

û stratejik dizane. Li her cihekî Êranê Kurd daxwaza mafêñ xwe yêñ kulturî bikin, Hikûmeta Herêma Kurdistanê piştevaniya wan dike. Netewen ne kurd yêñ Kurdistanê ji dê ji mafêñ xwe yêñ kulturî bê par nemînin.

■ Hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser bingeha serweriya axê, serxwebûn û cihêbûna sê dezgehêñ qanûn danînê, bicîhanîn û dadweryî û pilûralîmz û cudabûna ol ji hikûmetê tê avakirin.

■ Li Herêma Kurdistanê, çavkaniya deshilatê gel e. Gel wê deshilatê bi rîya nûneren xwe li parlamentoya Kurdistanê her wiha bi rîya organen hikûmetê bikar tîne.

■ Pêwendiya navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û dewleta federal ya Êranê, li ser bingeha yasayeke demokratik tê diyarkirin. Netewa kurd li Herêma Kurdistanana Êranê û netewen din ji li herêmên xwe, bi rîya dezgehêñ federal û bê ferq û cudatî, tevlî rêvebirina welet dibin.



- Herêma Kurdistanê xwedanê ala, sirûd û cejna netewî ya xwe ye. Tevahiya van mijaran li parlamentoya Kurdistanê tê destnîşankirin. Alaya Kurdistanê li ser hemû Ȧdareyên fermî û dewletê tê bilindkirin. Li Herêma Kurdistanê alaya Îrana federal jî li kèleka alaya Kurdistanê tê bilindkirin.
- Parlamentoya Kurdistanê bilindtirin organa qanûn danînê ya Herêma Kurdistanê ye. Endamên parlamentooyê bi rêya hilbijartineke giştî, wekhev, bi dengdaneke veşartî û yekser tên hilbijartin.
- Encumena Wezîran dengê baweriyê ji parlamentoya Kurdistanê werdigire, parlamento dikare lêpirsînê lê bike.
- Parastina aramî û pergala hundir ya Herêma Kurdistanê di stûyê polisê hikûmeta herêmê de ye. Wezîfeya Hêza Pêşmerge parastina ewlehiya netewî û serweriya Herêma Kurdistanê ye.
- Zimanê Kurdi zimanê fermî yê hemû qonaxên xwendinê û pêwendiyên Ȧdarî yê Herêma Kurdistanê ye. Li Herêma Kurdistanê, zimanê farsî jî li kèleka zimanê kurdi li medrese û xwendin gehan de tê xwendin.
- Pêwendiyên Herêma Kurdistanê bi beşen din yê Kurdistanê re her wiha bi welatan re hene, ku berjewendiyên Kurdan ligel wan hene, bi rêka nûnerên Herêma Kurdistanê û bi rêkeftin ligel hikûmeta federal tê birêvebirin.

## Beşa Sêyemîn

## Mafêñ Akinciyyêñ Herêma Kurdistanê

- Tevahiya maf û azadiyên ku di Peymana Gerdûnî ya Mafêñ Mirov û peymanên din de hatine ziman, li navçeya bin deshilata Hikûmeta Herêma Kurdistanê de jî derbas dibin. Tevahiya akinciyyêñ Kurdistanê, bê ferq û cudatiyên netewî, regezî û mezhebî, ji mafêñ civakî, aborî, siyasî û kultûrî yê wekhev südmend dibin. Azadiya raman û deskeftina agahiyan, mafêñ akinciyyêñ Herêma Kurdistanê ye û dabînkirina wan mafan jî wezîfeya Hikûmeta Kurdistanê ye.
- Jin û zilam di nav malbat û civakê de

xwedan mafêñ wekhev in, di wergirti na mûçe û kar de jî mîna hev in. Mafîjinan heye ji bêhnvedana ducanî tâdayîktlyê südmend bibin. Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bona nehîstina kultura serdestiya zilam bernameyel baş datîne, wê bernameyê qanûn dike û di civakê de jî bi cih tîne.

- Ji bona bicîhatina wekheviya regez û sererastkirina wê nedadperwerîyi siyasî, civakî û kutlurî ya ku pêşîrajinên Kurdistanê girtiye, li cihê ka û navendên girîng yêng biryardayîni fîrsendên taybet bo jinan têi



pêşxistin.

- Hikümeta Herêma Kurdistanê xwe li hember bicîhatina mafêñ zarakan, ku di Peymana Cihanî ya Mafêñ Zarakan de hatine ziman, berpirsiyar dibîne.

- Kêmîneyên netewî û ayînî yêñ Herêma Kurdistanê dibin xwediye hemû wan mafêñ ku di Peymana Gerdûnî ya Mafêñ Mirov de hatine ziman, û Hikümeta Herêma Kurdistanê jî di pêşxistin û parastina kultura wan de alîkariya wan dike.

## Beşa Çaremin

### A Siyaseta Aborî û Civakî

- Divê beriya pêşkêkirina siyaseta aborî û civakî ya Partiya Demokrat, were gotin ku çavkaniya dahata Kurdistanê samanên sirûstî, çandinî, torizm, wergirtina bacê û pişka Herêma Kurdistanê ji bûdceya giştî ya dewleta federal yan her dahatekedin ya hundir e. ErkêHikümeta Herêmê ew e ku siyaseta aborî destnîsan bike û wê dahatê jî bi awayekî parve bike ku rewşa aborî û civakî ya akinciyan Herêmê baştir bike û bibe sebeba pêşketina aboriya Kurdistanê.

- Pêşvebirin û geşkirina aboriyê bi rîka danîna bernameyeke zanistî li Herêma Kurdistanê, di stûyê Hikümeta Herêma Kurdistanê de ye. Divê dewleta federal dahata giştî bi awayekî parve bike ku li gorî asta paşdemayîna her navçeyeke Herêma Kurdistanê be da ku wê paşdemayîn gerebû bike.

- Yek ji rîkên serekî yêñ pêşketina aboriya Kurdistanê û Iranê, pêşxistina pîsesaziyê ye bi rîya bikaranîna teknolojî û zanistê. Ji bona ku pîsesazî

pêş bikeve divê guhertinek bingehîn di warên aborî û civakî de pêk were, ev jî yek ji erkên bingehîn yêñ dewleta federal û Hikümeta Herêma Kurdistanê ye.

- Hikümeta Herêma Kurdistanê bi rîya sektora giştî ya aborî, ku pişka serekî di pêşketina aborî de ye, pîsesaziya pêşketî li Kurdistanê ava dike û her cure hêşankariyêdike da ku sektora taybet û sermiyana biyanî di pêşxistina aboriya welat de bi taybet di pêşxistina pîsesaziyê de besar bibin. Hikümeta Herêmê herwiha parastina pîsesaziya hundir û netewî jî dike.

- Çavkaniyên sirûstî û bin`erd yêñ Kurdistanê mîna hemû herêmên Iranê, serweta/heiya giştî ne û Hikümeta Herêma Kurdistanê destpêkê jî bona pêşxistina aboriya Kurdistanê û baştirkirina rewşa aborî û civakî ya akinciyan Kurdistanê paşê jî bi dewleta federal re sûdê ji wan çavkaniyan werdigire.

- Hikümeta Herêma Kurdistanê girîngiyê dide mekanîzekirina çandinî û sewaldariyê û wê jî mîna beşek girîng ji

siyaseta aborî dibîne û hewla geşkirina wê dide. Hikûmeta Kurdistanê herwiha sektorên çandinî û sewaldariyê wek yek ji bingehêن serekî yên aboriya Kurdistanê dizane û ji bona pêşxistin, parastin û geşkirina çandiniyê û sewaldariyê, bi sûda cotyar û sewaldaran kar dike. Di vê çarçoveyê de bernamê datîne û bîryar û cihen pêwîst jê re destnîsan dike.

- Bilindkirina asta jiyanâ xelkê bi taybet mirovîn kedkarên Kurdistanê, navero-ka serekî ya siyaseta aborî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye. Ev hikûmet hêz û şiyana xwe bikar tîne da ku welatiyên Kurdistanê jiyanike xweş bijîn.
- Nabe heyama karê fermî di hefteyekê de ji 40 sa` etan zêdetir be. Ew karkirê ku karên giran dikin, divê sa` etên karê wan kêmtrî be. Divê herfî kêm heqdestê karkiran li gorî asta jiyanâ wan were

destnîşankirin. Divê karkir li hember rûdanêñ kar, nexweşî, nivîşkanî, bêkarî û pîrtiyê bêñ sigortkirin (bîmekirin). Yêñ ku temenê wan ji 16 salan kêmtrî e nabe kar bi wan bidin kirin. Divê mafê girev û xanenişînyê li Herêma Kurdistanê parastî be.

- Divê Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi pilanekezanîstî pêşîya perçebûna zeviyên cotoyaran bigire, da ku ziyan negîhê asta berhemanîna giştî.
- Hikûmeta Herêma Kurdistanê, ji bona avakirina civakeke salim, divê bi awayekî hûr û berfireh li arîşeyen civakî binêre û bernemeyeke zanistî bo çareserkirina wan dayne.
- Divê pêşxistin û geşkirina sektora torîzmê di rîza pêş ya pilana Hikûmeta Herêmê de be.

**B**

## Siyaseta Çandi Ú Perwerdeyê

- Li Herêma Kurdistanê, sîstema perwerdeye netewî "parallel" (hevterîb) di gel pîvanêñ perwerdeyê yên NY, herwiha nîrxên dirokî û netewî yên gelê Kurdistanê tê avakirin.
- Hikûmeta Herêma Kurdistanê girîngiyeke taybet dide pêgîhandin û perwerdekirina zarok û gencan û derfetên perwerdê û fêrkirinê bo wan dabîn dike.
- Divê tevahîya zarokê Kurdistanê heta temenê 15 saliyê bixwînin. Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo nehiştina nexwendewariyê gavan davêje. Li Herêma Kurdistanê dabînkirina pêdiviyên xwendî-

na seretayî di stûyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê de ye û xwendin û perwerde di qonaxên din de belaş e. Hikûmeta Kurdistanê xerc û pêdiviyên xwendinê yên xwendekarêñ ku malbatêñ wan belengaz in herwiha zarokêñ şehîdan dabîn dike. Xercêna xwendina xwendekarêñ jêhatî û hejar û zarokêñ şehîdan di qonaxa zankoyê de jî di stûyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê de ye.

- Hikûmeta Herêma Kurdistanê bo bilindkirina asta kulturî ya xelkê û avakirina navendêñ kulturî û zanistî gavêñ pêwîst davêje, û hewla berhevki-riñ û parastina kelepûra kurdi dide.



■ Pêşxistin û parastina ziman û edebiyata kurdî, piştevaniyîkirina nivîskar, hunermend û pispor û zanayen kurd, rîbaza herdem ya siyaseta kultûrî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye. Divê Hikûmeta Kurdistanê piştevaniya alimên ayînî yêñ nîştimanperwer bike.

■ Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêwîst e hewl bide di sîstema perwerdeyê de çanda hevtehemulkirinê (tebabûnê) bi cih bike, û dersxwanan wisa perwerde bike, ku ji kultura tundî û dijbertye dûr bikevin.

## C Siyaseta Tenduristîyê

- Hikûmeta Herêma Kurdistanê hewl dide asta tenduristî û silametiya xelkê Kurdistanê bilind bike, û wisa dike ku tevahiya xelkê Kurdistanê bîkarin ji alîkariyên nojdarî û dermanî sûdmend bibin.
- Hikûmeta Herêma Kurdistanê bo avakirina navendêñ vehesiyanê (geriyan û bêhnvedanê), dayîngeh û zayıngehan gavêñ pêwîst davêje, û herwiha bo xwedîkirina kesên bite-men û reben cihêñ taybet ava dike.

- Hikûmeta Herêma Kurdistanê, wan mafêñ ku di peymanê navdewletî de bo kêmendaman hatine ziman, dabîn dike.
- Hikûmeta Herêmê divê sigorteya (bîmeya) civakî bo hemû akinciyan Kurdistanê dabîn bike.
- Hikûmeta Herêma Kurdistanê divê bernameyeke wê ya taybet bo perwerdekirina zarokêñ xwedan pêdiviyêñ taybet hebe.

## D Siyaseta Parastina

### Jîngeh û Şûnwarêñ Dîrokî

■ Parastina jîngehê û çavkaniyêñ xwezayî, gol û candaran yek ji wezîfeyêñ Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye. Ji ber wê ji divê pêşîya nêçîra beredayî ya candaran were girtin. Divê di dema çêkirina rê û kişandina rîyîlêñ tirêñ de herwi-

ha çêkirina cihêñ pîsesazî de parastina jîngehê li ber çavan bê girtin.

■ Hikûmeta Herêma Kurdistanê xîmêñ pîsesaziya torîzmê datîne, û herwiha bernameyekê datîne bo parastina şûnwar û cihêñ kevnar û dîrokî.



## Destûra Federal Û Parvekirina Deshilatê

- Parvekirina serweriyê, bingehê sistema federaliyê ye. Ji ber wê ji divê serwerî û deshilat di navbera herêmên "Cografi-Netewî" de were parvekirin. Divê him deshilata federal him jî ya herêman, girêdayî qanûna federal bin.
- Dadgeha Bilind ya Federal, ku endamên wê ji pisporêñ hemû neteweyên Îranê pêk tê, li arîşeyen qanûnî yên di navbera dewleta federal û hikümetên herêmî dinêre, û hevseñgiya deshilatê di navbera wan de çê dike.
- Li Îrana federal, ci di nav dewleta federal de, ci jî li herêman, Dezgehêن Qanûndanîn, Biçîhanîn (Birêvebirin) û Dadweriyê ji hev cihê, û li hember hev serbixwe ne.
- Li Îrana federal, di Şûraya Federal û Encumena Nûneran de biryar li ser esasê rêkeftinê têr dayîn. Şûraya Federal ji nûnerên netewên welat pêk tê, û tevahiya biryarên Encumena Nûneran yên ku girêdayî maf û berjewendiyêñ herêman e, ji aliyê Şûraya Federal ve têr pesendkirin.
- Pesendkirina tevahiya wan qanûnên ku girêdayî herêman in, li gorî bingehê destûrî yên Îrana federal, mafê parlamentoyêñ herêman e.
- Hemû netewên Îranê, bêyî ferq û cuðatî, di avakirina sîistema federal de beşdar dibin û ev maf di qanûna esasî ya sîistema federal de jî tê pesendkirin.
- Yasaya bingehîn ya Îrana federal, li gorî pîvanên cîhanî yên mafêni mirovan: mafêni kultûri, siyasi, aborî û peymanen navdewletî, tê darêtin û nivîsandin. Divê wisa were nivîsandin ku mafêni netewî, etníkî, ayînî, zimanî û civakî yên tevahiya gelan di sîistema federal de werin misogerkirin, û di çarçoveya sînorêñ cografi yên herêman de jî bi fermî bêñ nasîn.
- Mijarêñ hevbeş yên mîna dirav, artêş, bernameya demdirêj ya aborî, çavkaniyêñ dahatê û parvekirina dadperwerane ya serwetên giştî û siyaseta derive divê di bin deshilata hevbeş ya hikümetên herêmî û hikümeta federal de bin.

**Beşa  
Şeşemîn****Siyaseta Derve ya Îrana Federal**

- Îrana federal bi hemû dewletên cîhanê re li ser bingeha rêzgirtina dualîû nasîna mafê serweriya nîştimanî, pêwendiyê datîne û ligel welatên pêşketî û demokratîk û welatên ku rêz ji mafêni mirov digirin, pêwendiyêni dostane datîne.
- Îrana federal li nav NY û li derveyî NY jî piştevaniya aştiya cîhanî û pêkvejiyana aram ya dewletan dike û alîgirê çareserkirina aştiyaneye arîşe û aloziyên navdewletî ye. Eger civaka navdewletî bo parastina aştî û aramiya navdewletî bixwaze fişarê bi kar bîne, wê çaxê jî piştevaniya wê yekê dike.
- Siyaseta derive ya Îrana federal li ser bingeha dostaniya netewan û hevkariya siyasi, aborî û kulturî bi rê ve diçê.
- Divê Îrana federal piştevniyê ji bicîhanîna pîvanêni demokrasiyê li seranserî cîhanê bike, û pistgiriyêbide xebata netewên bindest ya destnîşankirina qedera xwe, û mafê penaberiya siyasi bide mirovîn demokrasîwaz û nîştimanperwer.
- Herêmên Îrana federal, ji bo parastina berjewendiyen xwe, dikarin nûnertiya xwe li welatên din vekin.

**Beşa  
Heftemîn****Siyaseta Parastinê**

- Siyaseta parastinê ya Îrana federal, li ser bingeha parastina berjewendiyen hevbeş yênetewenÎrana federal tê danîn.
- Artêşa Îrana federal ji çekdarêñ hemû herêmên federal pêk tê, û fermandehiyeke hevbeş wê artêşê bi rê ve dibe. Mafê artêşê tine ku

destê xwe bixe nav karêñ hundir yêñ herêman.

- Îrana federal divê xwe ji çekirina çekên komkuj û qedexe dûr bigire, û girêdayî hemû rêkeftinêñ cîhanî yêñ şerbe.



# PEYREW PARTIYA DEMOKRAT YA KURDISTANA İRANÊ



## Benda 1

### Benda 1 Nav û Naveroka Partiyê

#### ■ NAVÊ PARTİYÊ: PARTİYA DEMOKRAT YA KURDISTANA İRANÊ

Di vê peyrewê de partiya demokrat jî tê gotin. Meydana xebata partiya demokrat seranserî rojhilatek kurdistanê û ew deverên Iranê ye, yên ku kurd lê hene.

■ Partiya demokrat, partiya pêşeng û şoresger ya xelkê kurdistana Iranê ye û tex û çinên civaka kurdistanê ji bona bîchîhanîna armancêñ xwe yên ku di bernamê de hatine ziman, tevîlî refen xwe dike û organîze dike.

■ Navê partiyê di qadêñ navdewletî de: demorat party of Iranian kurdistan

Kurteya navê partiyê: pdki

#### Amblema (logoya) Partiyê

##### Amblema

Partiya Demokrat ya Kurdistana Iranê wiha ye: Bazinek şîn e ku li aliyê wê yê rastê simbileke genim (gulegenimek) bi rengê zer heye. Li aliyê cepê çerxek pişesazîye bi rengê spî heye ku ji heft nikilan (dendeyan) pêk hatîye. Di nav bazine de rojek heye ku deh tîrêjîn wê hene, ciyayek jî heye bi rengê kesk. Di navbera simbila genim û çerxa pişesazîye de cîhek sor heye ku pirtûkek spî li ser e, û hejmara 1324 li bin pirtûkê hatîye nivîsandin. Ew hejmar heman sala avabûna Partiya Demokrat ya Kurdistana Iranê (1945) ye.

**NOT:** Di çalakiyêñ partiyê yên li derveyî welat de, li şûna 1324 sala 1945 û di bin ambleme de jî PDKI tê nivîsandin.



## Benda 2 Endamtiya Partiyê

- Her kurdek li her dera Îranê herwiha her welatiyekî/a Rojhilatê Kurdistanê dikare bibe endamê/a Partiya Demokrat, bi mercekî ku temenê wî/wê ji 18 salan këmtir nebe, Ù bernamê Ù peyrewa partiyê qebûl bike

### NOT:

Her kurdê ku welatiyê/a Îranê be yan ji her kurdê Rojhilatî yê ku li derveyî welêt bijî yan ji li diyasporayê ji dayîk bibe, dikare bibe endamê/a partiyê.

## Benda 3 Wergirtina Endaman

Ji bona ku kesek bibe endamê/a partiyê divê:

- Bi fermî daxwaza endamtiyê bike û du endamên partiyê wî nas bikin.
- Herî kêm şes mehan di bin çavdêrî û ceribandinê de bimîne, bi bêy mafê hilbijartin û xwe berbijêrkirinê.

- Ji aliyê organên teşkilîata pêwendîdar ya partiyê ve were wergirtin.

### NOT:

Endamên partiyê yênu ku li welatên rojavayı dijin dikarin bibin endamên rëxistinêne pêşketinxwaz û demokratik yênu wan welatan.

## Benda 4 Erkên Endamê/a Partiyê

Erkên endamekî/a partiyê ev in:

- Ji bo bicîhanîna armancêñ partiyê ku di bernameyê de hatine ziman, xebat dike.
- Bi hemû hêza xwe hewla parasîn û geşkirina siyasi û yekitiya nav partiyê dide.
- Li gorî peyrewa partiyê disiplîna partiyê diparêze.
- Di nav yek ji organên partiyê de bi awayekî aktif kar dike.
- Sirren partiyê diparêze.
- Divê asta zanabûna xwe ya siyasi û pêgeha xwe ya civakî bilind bike.

- Ji xelkê re behsa siyaseta partiyê bike û pêwendiyên wan bi partiyê re xurt bike û ji hîzr û tecrubeyên wan ji sîd werbigire.
- Biryarê hizbî û rêkxiraweyî bi rê ve bibe, û raporê bide organên pêwendîdar.
- Abonetiya endamtiyê bi awayekî rêkûpêk bide.

### NOT:

Yênu ku piştevaniya siyaseta partiyê dikin lê erkên endamtiyê bi temamî bi cih nahînin, wek alîgirêñ teşkilatî ên partiyê têñ naskirin.



## Benda 5

## MAFÊN Endamê/a Partiyê

Mafên endamê/a partiyê ev in:

- Li gora rêuşünên pêwendîdar hem dikare hilbijêre, hem jî dikare were hilbijartin.
- Dikare wek endamê/a yek ji organên partiyê were hilbijartin, ew jî li gorî hinek şertên taybet dibe.
- Dikare kar û çalakiyên her endadm yan jî organike partiyê binixhîne û di civînên partiyê de bixe rojevê yan jî rexne bike.

■ Bi rêkên rêxistinî û teşkilatî, dikare nêrîna xwe li hemû organên partiyê ragihîne, pirs bike û bersiv wergire.

■ Dikare li ba her organekî partiyê gili li organike din bike û bersiva giliyê xwe werbigire.

■ Dikare tevî wan civînên organa xwe bibe, ku tekoşîna hizbî û siyasi ya wî/wê binixhîne, û bixwaze bîryarê li ser bide.

## Benda 6

## DİSİPLİNA ENDAM

■ Ew endamên ku erkên xwe bi cîh nahînin yan li dîjî peyrewapartiyê kar di-kin yan jî karekî dîkin ku ziyanê digihîne pirestüja partiyê, yan abonetiya endametiyye nadîn, li gorî rîjeya binpêkirina dîsiplîna partiyê, bi vî awayî têن cezakirin:

- Bi devkî sexerbîrin
- Bi nîvîskî sexerbîrin û cezakirin
- Jêstandina berpirsatîyê
- Cemidandina endametiyyê (Helavîstina endametiyyê)
- Wergirtina heqê endametiyyê

■ Cezayê endaman ji aliyê organên pêwendîdar yêñ partiyê ve tê diyarkirin û bîryara standina mafê endametiyyê jî ji aliyê organên jortir ve tê dayîn.

■ Qesta cezakirina endamekî pêglîhandina endam e, û tenê di demekî de tê cezakirin ku rêkên mîna rexne, şîret û hisyârkirin û iqna`ê ti bandorek li ser wî/wê çênekiribe.

■ Ew endamên ku têن cezakirin, mafê wan heye li organên din bertek nişan bîdin. Ew endamên ku têن derxistin jî dikarin gîlinameya xwe ji konglireya partiyê re bişînîn.

■ Ji bo dilxweşkirina endamên hizbê û rêzgirtina ji kar û tekoşîna endamên çalak û herwisa bo baştir birêveçûna disiplîna hizbê hewce ye ku li kîleka cezakirinê divê endamên jêhatî û aktif jî bêñ xelatkirin û bo vê yekê divê organên pêwendîdar endamên aktif û serkeftû bi vê yekê teşwîq bikin.

**NOT:** Herî zêde endametî salekê tê cemidandin. Ewê/a ku endamtiya wî/wê hatîye cemidandin, ti mafekî wî/wê yê endamtiyyê namîne. Pîstî ku heyama cemidandina endamtiya endamekî xilas bû, wê çaxê organên pêwendîdar derbazbûyiya wî/wê ya hizbî berçav digrin, û ji aliyê organa serwetir ve kar bo wî/wê tê diyarîkirin.



## Benda 7

### PÊKHATEYA PARTIYÊ

Pêkhateya partiyê li ser bingeha desantralîzekirina partiyê û parvekirina erk û deshilatê hatiye avakirin, û di vê çarçoveyê de kordinasyon û hevsengiya navbera berpirsiyartî û selahiyeta berpirs û organên partiyê de organize dike. Ev pêkhate li gorî siyaset û helwesta partiyê li hember xebata paşerojê di warêni siyasi, çekdarî, medyayî û rôexistinî de hatiye danîn. Desantralîzekirina partiyê mîna bingehetek giştî tê dîtin.

#### Pêkhateya partiyê li ser wî esasî tê danîn ku:

- Rêveberiya tevahiya organên partiyê bi hilbijartinê tê destnîşankirin.
- Organên partiyê bi awayekî peryodî raporta xebat û çalakiyên, hem didin konferansan hem jî didin organên pêwendîdar.
- Hevsengiya di navbera mafêñ endam û organên partiyê divê bi awayekî were ragirtin, ku ne xuluqkarî (afirandin, dahênan) û azadiya şexsî binpê bike, û ne jî çarçoveya organî xirab bike. Kêmîne di nav organên partiyê de girêdayî biryaren giştî dibe. Kêmîneya hizri û siyasi, mafê wê yê parastina nêrînê, bi rêya civîn û belavokêñ hundir parastî dibe.
- Di nav partiyê de ji bo hemû endaman, li gora peyrewa navxwe yek dîsîplîn heye, bê ferq û cudatî.
- Gava organek jortir biryarekê dide divê bi organa jêrtir re bişêwire, vêca organa jêrtir wê biryarekê bi cîh bîne.
- Di nav partiyê de danîna pilan û bername ji jortirîn organ heta jêrtirîn organ, bi awayekî komî ye. Mafê kesî tine bi serê xwe û bi tenê biryarekî bide û pilanekî dayne.

## Benda 8

### KONGIREYA PARTIYÊ

- Kongire, jortirîn organa partiyê ye ku li serbingeha peyrewa partiyê, çar salan carekê tê lidarxistin.
- Kongire, strateji û siyaseta giştî ya partiyê, bername û Peyrewa partiyê pesend dike, û rêveberiya nû ya partiyê hildibijêre.
- Endamên kongireya partiyê ji endamên Navenda Siyasi, Desteya Kargêri, û delegeyêñ (endamên hilbijartî yên) konferansên organên siyasi û kargêri yên partiyê, û endamên partiyên yên li derveyî welêt û li Kurdistanê pêk têñ.

**NOT 1:** Navenda Siyasî Ù Desteya kargêrî dikarin bi awayekî hevbeş komek berpirsên organan Ù Fermandehiya Pêşmerge destnîşan bikin ji bo ku rastearast bi mafê dengdanê tevlî kongireyê bibin. Bi şertekî ku ew kesen han beriya konferansan bêñ destnîşankirin Ù tevlî konferansan jî nebin. Ji sê pişkan, du pişkêñ endamên kongireyê bi hilbijartînê beşdarî kongireyê dibin.

**NOT2:** Eger Navenda Siyasî Ù Desteya kargêrî lazim bibînîn, kongire dikare ji 4 salan zütir jî were lidarxistin. Navenda Hilbijartinan ya partiyê berpirsa organizekirin Ù rêvebirîna konferans Ù hilbijartinan e.

### Erk û deshilatêñ kongireyê ev in:

- Stratejî Ù siyaseta giştî, Ù bername Ù Peyrewa partiyê pesend dike.
- Berpirsyarê Giştî yê partiyê. ku berpirsê Desteya Kargêrî ye jî.
- Hejmara hewce ya endamên Navenda Siyasî pesend dike Ù wan hildibijêre

## KONGIREYA AWARTE

KONGIREYA AWARTE, Bİ BEŞDARBÜNA HEMÛ ENDAMÊN NAVENDA SIYASÎ, DESTEYA KARGÊRÎ, BERPIRSÊN ORGANAN, ENDAMÊN ESLÎ YËN BEŞAN, FERMANDEYÊN PÊŞMERGE Ù BERPIRSÊN RÉKXISTINÊN EŞKERE TÊ LIDARXISTÍN. KONGIREYA AWARTE WÊ DEMÊ TÊ LIDARXISTÍN KU FIRSENDA LIDARXISTÍNA KONGIREYA NORMAL TUNEBE. DÍ REWŞEKÊ DE KU NAVENDA SIYASÎ NEKARIBE ERKA XWE DÍ MIJARÊN GIRING YËN SIYASÎ DE BI AWAYEKÎ BAŞ BI CÎH BÎNE, JI BO LIDARXISTÍNA KONGIREYA AWARTE DIVÊ: JI SÊ PIŞKÊN ENDAMÊN DAYIMÎ, DU PIŞK DAXWAZ BIKIN. YAN JÎ JÎ SÊ PIŞKAN DU PIŞKÊN DELEGEYÊN CIVINA HEVBEŞ YA NAVENDA SIYASÎ Ù DESTEYA KARGÊRÎ DAXWAZ BIKIN.

**NOT:** Civîna hevbeş ya Navenda Siyasî Ù Desteya Kargêrî dikare herî zêde bi qasî nîvê endamên xwe endamên partiyê Ù şêvirmendên organên partiyê tevlî kongireyê bike. Divê ev yek li pêsiya konferansan were kirin, çimkî ewên ku hatine destnîşankirin, di konferansan de nikarin deng bidin.

- Ew kesen ku dibin endamên Navenda Siyasî yan jî berpirsê/a giştî, divê xwedanê taybetmendiyêن berçav, yêñ ku ji aliye Navenda Hilbijartinan ve têñ destnîşankirin, bin.

**Benda  
9****Konferansa Organên Partiyê**

- Konferansa organê ji wan endaman pêk tê ku herf kêm 6 meh ji endamtiya wan derbas bibe.
- Kesên ku dixwazin tevlî kongireya partiyê bibin divê:
- Herf kêm du sal bi ser endametiya wan re derbas bibe.
- Karnameya xebata wan tê nirxandin, û li gorî pîvanên kifşkirî tê hilbijartin.

**NOT:**

- Piştû ku konferansa organan xilas bû, nûnerên ku di konferansê de hatine hilbijartin li hev dicivin, û bi raportekê nêrin, pêşniyar yan jî rexneyên xwe amade dikin. Ew raport ji aliyê kesekî ve, ku nûneratiya nûnerên han dike, pêşkêşî kongireyê tê kirin.
- Konferansa organan lazim e herf kêm 2 mehan beriya kongireyê bê kirin, û her organek raporta xwe ya konferansê ji bo komiteya amadekar ya kongireyê bişîne.

**Benda  
10****NAVENDA SIYASÎ**

- Navenda Siyasî organike partiyê ye ku karê wê danîna qanûnan, û herwiha destnîşankirina siyaseta giştî ya partiyê ye di çarçoveya biryar û strateji û bermameya ku di kongireyê de hatine pesendkirin.

- Civîna Navenda Siyasî bi beşdarbûna ji sê pişkan 2 pişkîn endaman, dibe civîneke rewa, û biryarêne wê jî bi dengen piraniya endamên beşdar têne pesendkirin.

**Erk û Deshilatêñ Navenda Siyasî:**

- Xetêñ siyasî yêñ partiyê di çarçoveya biryarêne kongireyê de kifş dike û pesend dike.
- Qanûnen organên kargêri yêñ partiyê pesend dike.
- Dikare organan ava bike yan jî li gorî qanûn û pîvanên pesendkirî yêñ partiyê, hilweşîne.

- Çavdêrî û şopandina birêveçûna fermanên Desteya Kargêri, dezgehêne lidûcûn û çavdêriyê, hilbijartin û Berpirsyarê Giştî dike.
- Berpirsê pesendkirina pêkanîna tifaqî yan jî guhertina pêwendîyan bi partî û aliyen siyasî re ye.
- Ew endamên ku Berpirsyarê Giştî bo endamtiya Desteya kargêri pêşniyar ki-

riye, pesend dike.

- Bi réya Dezgeha Çavdêrî û Şopandinê, çavdêriya karê Berpirsyarê

**NOT:**

Eger Desteya kargêrî lazim bibîne ku organek nû bo partiyê ava bike, yan ji organek partiyê hilweşîne, divê Navenda Siyasi rizamendiyê li ser vê yekê nişan bide.

Giştî û endamên Desteya kargêrî dike.

- Dema Berpirsyarê Giştî nekarî partiyê bi rê ve bibe, wê çaxê Navenda Siyasi dikare baweriyê jê bistîne, û wî ji kar dûr bixe.
- Eger Berpirsê Giştî jiyanâ xwe ji dest da, yan ji bawerî jê hat standin, heta lidarxistina kongireyê cîgirê yekem yê Berpirsyarê Giştî karûbarên partiyê bi rê ve dibe.
- Hekî cîgirê Berpirsyarê Giştî ji nekarî erkên xwe bi cih bîne, bawerî ji wî/wê ji tê standin û kesek din ji nav endamên Navenda Siyasi li dëwsa wî/wê tê destnîşankirin. Ew, heta kongireya awarte partiyê bi rê ve dibe.
- Endamên Navenda Siyasi, li kongireyê de û di nav kadr, pêşmerge û endamên jêhatî yêng partiyê de têne hilbijartin.
- Karên piraktikî bi endamên Navenda Siyasi nahêne dayîn, ji ber vê ji ne mecbûr in her gav amade bin.
- Navenda Siyasi herî dereng her 10 rojan carekê dicive, û bersiva raport, pêşniyar yan her niviseke fermî ku ji aliyê Desteya kargêrî ve gihiştibe wan, dide.
- Navenda Siyasi herî kêm serê her werzekê ji dicive.
- Navenda Siyasi û Desteya kargêrî herî kêm salê du caran bi hev re dicivin, ji bo pêkanîna kordinasyonê di navbera navendên qanûndanîn û rêveberiyê de.
- Desteya Kargêrî hinek kesan bo berpirsiyartiya karûbarên partiyê li derveyî welat, ji Navenda Siyasi re pêşniyar dike.
- Endamên Navenda Siyasi yêng ku li derveyî welat kar dîkin, ji aliyê kongireyê ve têne hilbijartin.
- Dezgeha Hilbijartinê di çarçovuya qanûnên hilbijartinê de kar dike, û endamên wê ji aliyê Navenda Siyasi ve têne hilbijartin.
- Dezgeha Çavdêrî û Şopandinê ji aliyê Navenda Siyasi ve têne hilbijartin, û çavdêriya karên partiyê dike, û raporta xwe ji dide Navenda Siyasi û Desteya Kargêrî.



## Benda 11

### Desteya Kargêri

Berpirsyarê Giştî yê partiyê, ku di kongireyê de tê hilbijartin, berpirsê Desteya Kargêri ye û organên partiyê bi rêya vê navendê tê birêvebirin. Berpirsyarê Giştî û rayedarên din yên partiyê, Desteya Kargêri pêk tînin.

#### Erk û deshilatên Desteya Kargêri ev in:

- Biryarêñ Navenda Siyasî û erkên xwe bi cih tîne.
- Hesabê dide Navenda Siyasî û raporta karê xwe dide wê organa partiyê.
- Pêşniyârên organan bo destnîşankirina hevkarêñ wan, ku li gorî pilana kar be, pesend dike.
- Desteya Kargêri bi awayekî rêkûpêk dicive, û bi komî biryar dide.
- Endamên Desteya Kargêri hemû gavan di xizmeta partiyê de dibin, û li gorî pîvanên pesendkirî têne pêşniyarkirin.

#### NOT:

Eger Desteya Piraktikê bixwaze organeke nû ava bike, yan jî yet ji organên partiyê hilweşîne, divê bi rizamendî û pesenda Navenda Siyasî be.

- Berpirsên karûbarêñ partiyê yên li derveyî welat, divê li gorî pîvanan û bi pêşniyara Desteya Kargêri û pesendkirina Navenda Siyasî bêñ destnîşankirin.
- Navenda rêxistinêñ demokratik û sivil li gorî qanûn û pîvanên diyarkirî girîngiyê dibînin, û karûbarêñ wan di çarçoveya Desteya Kargêri de têne organîzekirin.

## Benda 12

### Berpirsyarê/a Giştî

- Berpirsyarê/a Giştî, berpirsê/a Desteya Kargêriya partiyê ye, û tevlî civînên Navenda Siyasî jî dibe.
- Di navbera beşen serekî yên partiyê de kordînasîyonê pêk tîne.
- Rêvebirina civînên Desteya Kargêri di stûyê wî/ê de ye.
- Parastina yekrêziya nav partiyê, di stûyê hemû organan de ye, û yet

ji erkên Berpirsyarê/a Giştî ye.

- Li kîleka komîteyeke sê kesî de, berpirsê/a karûbarêñ darayî û aboriyên partiyê ye jî.

#### NOT:

Berpirsyarê/a Giştî li gorî qanûn û pîvanên partiyê endamên Desteya Kargêri destnîşan dike, û bi Navenda Siyasî dide nasîn û pesendkirin.

- Her berpirsē/a ku ji aliyē berpirsē/a giştî ve bo endamtiya Desteya Kargērî tê pêşniyarkirin, hekî dengen pêwist nehîna, dikare cardin were pêşniyarkirin, lê hekî dîsa dengen pêwist nehîna, divê Berpirsyarê/a Giştî herî zêde di nav mehekê de kesek din pêşniyar bike.

## Benda 13

### Cîgirê/a Berpirsê Giştî

Kordinatorê/a Navenda Siyasî ye ku di civîna yekem ya Navenda Siyasî de, û bi pêşniyara Berpirsyarê/a Giştî tê hilbijartın, û dibe cîgirê/a yekem yê/a Berpirsyarê Giştî.

- Cîgirê/a berpirs, dema berpirs li ser kar nebe, li şuna berpirs kar dike.
- Civînên Navenda Siyasî kordîne dike.
- Cîgirê/a Berpirsyarê/a Giştî tevîlî civînên Desteya kargêrî dibe.

**NOT:** Berpirsyarê/a Giştî hekî hewce bibîne, dikare cîgirekî din ji bo xwe destnîşan bike, lê divê ji aliyê Navenda Siyasî ve were pesendkirin.

## Benda 14

### Navenda Şopandin û Çavdêriyê

Dezgehek e ku ji aliyê Navenda Siyasî ve hatiye avakirin. Rêveberiya wê dezgehê ji sê kesan pêk tê, û ji aliyê Navenda Siyasî ve têن destnîşankirin. Navenda Şopandin û Çavdêriyê dikare li gorî pêwîstiya xwe, kesen pispor ji bona şopandin û çavdêriyê destnîşan bike, çi dayimî (hertimî) çi demkî.

- Navenda Şopandin û Çavdêriyê

tevahiya karêñ îdarî, darayî û qanûnî yêñ partiyê dişopîne û çavdêrî dike.

- Navenda Şopandin û Çavdêriyê bi awayekî peryodî karê xwe dike, yan jî li ser daxwaza Navenda Siyasî, Desteya Kargêrî yan jî Berpirsyarê Giştî beşek ji karêñ partiyê dişopîne, paşê jî raporta xwe dide wan saziyan.

## Benda 15

### Navenda Hilbijartinê

Tevahiya hilbijartinêñ partiyê ji aliyê Navenda Hilbijartinê ve têne birêvebirin. Rêveberiya vê navendê ji sê kesan pêk tê ku ji aliyê Navenda Siyasî ve tên destnîşankirin.



- Ew qanûn û ayînnameyên ku Navenda Hilbijartinê bi wan kar dike, di çarçoveya Peyrewe Navx-we ya partiyê, û ji aliyê Navenda Siyasî ve têن pesendkirin.

#### **NOT:**

Navenda Hilbijartinê, ji bona bilindkirina asta besdariya jinan di rëexistin û çalakiyên partiyê de, di çarçoveya qanûnên ku ji aliyê

- Navenda Hilbijartinê raportên karê xwe dide Navend Siyasî û Desteya Kargêri.

Navenda Siyasî ve hatine pesendkirin, pişka jinan di hilbijartinan de destrişan dike. Divê di wan jinan de şert û mercen berbijartiyê hebin.

### **Benda 16 Rëexistinên Partiyê**

- 1) Du cure rëexistinên partiyê hene: Şaneyên teşkilatî û rëexistinên pîşeyî û taybet
- 2) Komîteya partiyê li her deverkê ji wan kesen ku di konferansa wê komîteyê de hatine hilbijartin, pêk tê.
- 3) Komîteya her rëexistinekê ji aliyê endamê wê rëexistinê ve yan

jî nûnerên wan endaman ve û li gorî qanûnên hilbijartinê tê hilbijartin.

- 4) Konferansên komîte û rëexistinan her du salan carekê, ji nûnerên hemû endamên her organekê pêk tê.
- 5) Di dema pêwîst de Desteya Kargêri dikare çend komîteyên ku warê xebata wan mîna hev e, navendek mezintir pêk bîne.

### **Benda 17 Darayıya Partiyê**

Berpirsiya gjîstî ya dahat û darayıya partiyê di stûyê Desteya Kargêri de ye. Karûbarên darayı ji aliyê organeke taybet ve, ku di benda dozdehan de hatiye ziman, tê birêvebirin.

Çavkaniyên darayıya partiyê:

- Abonetiya rëexistinên partiyê
- Abonetiya endamên partiyê
- Alîkariyên ku endam, alîgirên

partiyê û welatperwerên azadîkwaz di-din.

- Dahata çalakiyên aborî yêng bingeh û dezgehên partiyê



# PARTIYA DEMOKRAT YA KURDISTANA ÌRANÊ (PDKI)

*PDKI Media © 10 March 2018*